



Danxuyandina Çapemenîyê - 399/05/2020

Bi şertê ku di çarçoveya karkirina sînorkirî de be dê zarokxane vebin

**Wezîr Stamp: Dê ji 8ê Hezîranê pê de hemû zarok bi awayekî
kêmkirî karibin herin zarokxaneyan**

**Wezîraya Zarokan, Malbatê, Bextxwazan û Entegrasyonê vê dide
zanîn:**

Bakurê Ren-Vestfalyayê bi awayekî ku proseya enfeksiyonê jî bide pêş çavên xwe li ser hinbihin vebûna cîhên xwedîkirina zarokan xuyandina konseptê xwe dewam dike. Ji 28ê Gulana 2020ê û pê de zarokxane dê ji bo hemû zarokên pêşxwandingehê yê pîlankirî vebin. Di 8ê Hezîranê de di pîlanê Bakurê Ren-Vestfalyayê de gava pêştir diavêje û têdikoşe ku ji pêkanîna kêmkirî ya firehkirî der bikeve karkirinê. Hemû zarok paşê di çarçoveyê kêmkirî de dê karibin herin navendên xwedîkirinê û zarokxaneyan.

Wezîrê Malbatê Joachim Stamp: “Ez dizanim ku çendîn malbat di heftayên paşîn de gihîştine sînoren diberxwedanê û çendîn zarokên ku hînbûna zû ya wan a zaroktîyê tune ne her roj ji fersendan tîm bêparhiştin. Hema piştî ku barê berpîrsîyarîya wê karibe bê hilgirtin ji hemû zarokan re di demê demildest a mumkun de peyderkirina xwedîkirina zarokan mebesta min a teqez bû. Ji ber vê hinde dema ku miqdarê enfeksiyona kêmbûyî mirov tîne ber çavan ez gelek kêfxweş im ku em pîlanê vebûnê di gaveke pêş de ji pêkanîna xwedîkirina bîlez bînin bixin çarçoveya karkirina kêmkirî.”

Di rewşa tînga kêmbûna enfeksiyonê de em wek Wezîrîya Karên Malbatê ya Bakurê Ren-Vestfalyayê bi awayê ku em ji qada hînkirina zarokan û paqijîyê desteka zanistî ya navdisiplînan bistînin, di heyama Koronayê de li ser awayê ku zarokxane û navendên xwedîkirina zarokan ên biro dê çawa zarokên bi jimarên xwe bêtir dibin xwedî bikin, me pêşniyarîyeke xeyalî ava kiribû. Karkirina kêmkirî dê di çarçoveya parastina enfeksiyonê de pêk bê. Eyalet, di heman demede ji peyderkerên xizmetê re, ji bo ku ew guherîna divê bi hişyarî kar bikin

20.05.2020
Rûpel 1 ji 4an

Pressestelle Staatskanzlei
40213 Düsseldorf
Têlêfon 0211 837-1134
0211 837-1405
yan 0211 837-1151

presse@stk.nrw.de
www.land.nrw

zemanî dide wan. Her wekî di hemû gavên konseptê vebûnê de ye, ji 8ê Hezîranê pê de karkirina kêmkirî, bi belediye û peyderkerin din ên xizmetê re tê birêxistin.

Ji 8ê Hezîranê pê de di xwedîkirina zarokan de karkirina kêmkirî:

- Qedexeyîya ketina navendên xwedîkirina biro û zarokxaneyan hatiye rakirin,
- Pêkanîna xwedîkirina bilez a berê pêkhatî hatiye rakirin,
- Dê hemû zarok di şûna 45, 35, 25an de di hefteyê de karibin 35, 25, 15 seet, bi demeke kêmtir karibin herin navendên xwedîkirina biro/zarokxaneyan,
- Zarokxaneyên ku ji ber kapasîteya xwe ya cîhê û rênçberanseetên bêtir dikarin pêşkêş bikin, dikarin vê bi desthilatdarîyên çavdêrîyê yê berpirsîyar bişêwirin û pêk bînin,
- Navendên xwedîkirinê yê biro yê ji ber rewşa xwe ya rençberan nikarin vê xizmetê bikin, bi awayê ku bi nivîsingeha gêncan a herêmî bişêwirin dikarin rênçberên kêmtir bi kar bînin; lêbelê ev divê bi tenê di rewşên îstîsnaî de pêk bê;
- Rewşên ku parastina zarokan zehmet dikirin û zehmetîyên taybet divên di çarçoveya xwedîkirinê de bînin ber çavan.

Di 8ê Hezîranê de karkirina kêmkirî, di çarçoveya rewşa taybet a pêkanîna xwedîkirina awarte ya bere de ji bo zarokên ku dê û bavê wan dikarin ji xwedîkirina dormedor feyde bînin jî di rewacê de ye. Wezîrê Karên Malbatê Stamp: "Ez gazîya hevgerîyê li hemû dê û bavên dikin. Di vê gava nû de di buhurîna karkirina kêmkirî de dê zehmetîyên mezin hebin. Dê her tiştê bê teşqeke bi rê ve nece. Divê her kes ji bo vê karê xwe bike."

Di çarçoveya karkirina kêmkirî de ji bo zarokan vebûna xwedîkirina biro, dê bi kêmkirinên berbiçav û neberbiçav pêk bê. Hê mirov nikare bigihîje standardên Qanûnê Hînkariya Zarokan û pêdivêya rênçberê pispor nikare bê qedandin. Lêbelê Wezîrîya Karê Malbatê ya Bakurê Ren-Vestfalya ji bo xebata kêmkirî standardên eşkere bi nav kirine:

- Bitenê komên sabit hene, konseptên eşkere tune ne,
- Di her komê de bi kêmayî dê kesê pispor bê xebitandin,
- Dê wek cîh ji hev cudakirina koman bê dewamkirin,

- Hemû bihevvebûn divên karibin bên temaşekirin, têgehên paqijîyê bên pêkanîn.

Qedexeyîya ketina li ser xwedîkirina zarokan a biro dê di 8ê Hezîranê de rabe. Wek payde, hemû zarok dikarin li rênçberên xwedîkirina biro. Tevlî vî awayî, ji ber ku hemû rênçberên li vê herêmê tune ne, dibe ku xwedîkirin di asteke kêr de be.

Wezîrîya malbatê, derbasbûna ji xwedîkirina bilez a firehkirî bi karkirina kêmkirî ve, di komeke nimûne de bi çavdêriyeke zanistî taqîb dike. Di vê çarçoveyê de her hefte bi hezaran zarok û pispor bi rêkûpêk di navendên xwedîkirina biro re tîstkirin û çavdêriya li proseya enfeksiyonê ji nêz ve tê kirin û nirxandin.

Di çavdêriyeke pêştir a zanistî de nehiştinên parêzkar ji alîyê tîbbîve tîstkirin û ji bo parastina rênçberan û zarokan tê kontrolkirin ka nehiştinên ewlehîya karî û paqijîyê çî çend bibandor in.

Wezîrê Karê Derve Stamp: “Em fikarên rênçberên xwe bi saxlemî dinirxînin. Ev ji bo min pir girîng e. Ji ber vî awayî bi tenê ji bo xwekarkirinê me nikarî em proseya têr a zemanî bibijêrin, di heman demê de em ê xasma karkirinên navendên xwedîkirina biro bi taybetî destek bikin.”

Di vê çarçoveyê de ev ê di rewacê de bin:

- Wek perçeyekî nehiştinên ewlehîya karkirinê wek alîkarîya serekî 2 milyon maskeyên FFP-2 û 3 milyon maskeyên neştergerîyê dê bîst dayîn navendên gîncanîyê,
- Ji bo telafîkirina barên pêvekî yê awarte yê ji ber tedbîrên saxlemî û ewlehîya karkirinê dê alîkarîya pereye bê dayîn dezgehên pêşkêşkirî xizmetê.
- Ji bo bi awayekî profesyonel bersivdayîna ji pirsên li ser paqijîyê û ewlehîya karkirinê dê ji hemû Yekîneyên birêvebirina xwedîkirina zarokan a biro re navendên şewirmendîya bi tîlefônê bîst peyderkirin. Ev navenda şîretkarîyê dê ji 26ê Gulana 2020î pê de karkirî bin.
- Bernameya xistina karî ya rênçberan a rênçberên ku alîkarên navendên xwedîkirina biro di cîhê cîh de destek bikin û bîst wan fireh bikin (nmn. Ên di şûştina destan, xistin û derxistina solan/pêlavan/şekalan de destek dikin) dê bê pêkanîn.

Wezîrê Malbatê Stamp: “Di gavên ku em niha diavêjin de ji bo her kesî zehmetîyên mezin hene. Em van gavan bi awayekî bi rêk û pêk, berpirsîyar û di binê çavdîrêya zanistî de diavêjin. “Gava karkirina kêmkirî pêşîn heta 31ê Tebaxa 2020î tê pîlankirin. Palpişt bi bidestketîyên zanistî, dê di nava meha Tebaxê de bê biryardayîn.

Li ser torê çavê we li me be:

Twitter: [@chancenrw](#)

Facebook: [Chancen NRW](#)

Instagram: [chancen_nrw](#)

YouTube: [Chancen NRW](#)

Çi pirsên we hebin ji kerema xwe ji jimara têlefonê 0211 837-2417ê serî li nivîsingeha çapemenîyê ya Wezîriya Zarokan, Malbatê, Bextxwazan û Entegrasyonê bixin.

Ev danxuyandina çapemenîyê di internetê de di vê navnîşana webe ya hikûmeta eyaletê de jî dibe bê dîtin [www.land.nrw](#).

[Danzanîna parastîna zanyarîyan a li ser çapemenîya civatî](#)